



# Erê Em Dişêyn Petrolê Bikeyne Kilîla Serbixobûnê?

## Metîn

Piştî rizgarkirina Îraqê û pesendikirina yasaya neft û xazê li perlemanê herêma Kurdistanê, arîşe roj bi roj dinavbera herêmê û hikûmeta navendî zêdebûn û hindêk caran gefên tund ji herdû la dihêne arastekirin bo hevdû. anku ev babete bûye egerê peydakirina nearamîyekê bo haulatîyên Kurd li herêmê û kesek jî nizanît ka bi dirustî kîş layen yê heqe. ev bigir û bikêşe wediket ko aluzî bihêztir lê bihên ta digehîte wî radey ko kefên birîna budca herêmê ji alîyê Bexda ve bihêne kirin û ji vî alî jî kefên serbixobûnê yan jêkvebûnê dihêne arastekirin. haulatî jî bûyne êxsîrê vê haukêşa tund û bitinê ji dûrve temaşey evê milmilanê



diken. lê yaseyr ewe ko hêşta haulatî yan hêza cadidê yan jî dengê milletî bo rizgarbûnê ji evê qeyranê nehatîye bikarînan û mifa jê nehatîye wergirtin. eger ev pirse liser binemayekê yasayî bît û dixizmeta gelê Kurd dabît, bila serkirdatîya Kurdî bizavê biket mifay ji hêza dengê milletî biket û raya giştî bazrînît û bikete gefek liser deshelata Bexda daku wê milkeç biket û deskeftên me mezintir û gerentî tir lê bihêt. lê eger karekê ne yasayî bît û hindek deriz û valahî devê pêngavê da hebin, bila deshelata Kurdî rastîyan bo xelkê xwe dîyarbiken daku piştevanîya cemawerî bo evê pêngavê ji dest nedet.

Ya dîyare ko neft û xaz dişên abûra herêmê bihêz biken û deshelata Kurdî xurt biken û kartên fşarê liser Bexda zêdetir lêbiken û senga herêmê liser astê nêvdewletî jî xurttir lêbiket. lê mixabin dîraqê da neft bûye egerê derdeserîyê bo gelên Îraqê bgştî û gelê Kurd bi taybetî. anku egerê peydakirina alozyê û çêkirina diktaturîyetan û derdeserîyan bûye bo gelên Îraqê, lewra ta nuke jî bê umêdî ji evê çendê heye û xelk yê reşbîne ko neft û xaz bibine egerê xoşguzeranîya wan palpiştîyek bît bo werara civakî û abûrî û hemû alîyên dî. hikûmeta herêmê bi evê



pêngavê dişê hizira xelkî bghurît û pêngavên kara bihavêjt daku rewşê beruvajî biket û dîtina xelkî bi gihurît û dengê bê umêdîyê û reşbînîyê bikete şemalka runahîya asuyên geştir bo gelê xwe. eger ne dîsa dê bîte derd û kevîte laşê gelê Kurd û parçe parçe ket. anku li şwîna ko bibîte egerê başkirina rewşa haulatîyan, dê gefeka dîtir bît bo jinavbirin û milkeçkirina wî, yan jî dibîte xaleka dîtir jibo dirustkirina gefên dujminî. lewra fere deshelata Kurdî sîyaseteka ruhn û stiratîjyeteka bihêz û pîlanên pulayî hebin taku bişêt nefta herêmê bikete kilîla serbixobûnê û ragehandina dewleta Kurdî.